

Kiriariya Roja Nû: ji bona erden Suriye û Libnan, 35 lreyen Suri; ji bona wela ten din 4 lreyen inglizi. Bihayê Hejmarek; 25 Qemer.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERİNENDE: Mîr Dr. KAMIRAN ALİ BEDIR-XAN

TEHRAN DIDE ZANIN

Li gora nûçeyen ko ji Tehranê tê, xelkê Azirican; erde Iranê û bakur, li hikumetê rabûn û di vî erdi de, teşkeleyine mezin çebûne û peyayen sileh bi dest ber bi Tehranê ve dimesin. Hikumeta Iranê du tabûr esker şiyandîn pêşîyan ko her bi payetexti ve tê. Radyo ya Amerikan dide zanin ko qiwetên silehbîdest yén ko dixwazin erde xwe ji yé Iranê vezetinîn gihane dera ko ji Tehranê bitenê 120 kilometr dûr e.

Ji aliye din, li gora telegrafen ko ji Enquerê tê û ejensa A.F.P. belav dike, ji kurden tirkayê qiwetine mezin, ketine erde Iranê û hatine arikariya kurdan Iran û Iraq; yén ko di Kurdistanâ Iranê û kom bûne û hêj kom dibin. Nûçeyen dawin didin zanin ko 15.000 eskeren kurd di Kurdistanâ Iranê de, xwe pêk anfet.

KURDISTANA IRANÊ

Rojnameyên Tehranê û dawin yén ko gihane destê me, mina Seba, Eres û Iranê Kinîni, zehf qala xebata kurdan Kurdistanâ Iranê dîkin. Li gora van rojaman, hemi kurdan Iranê istiqlala Kurdistanâ û danina Kurdistanane mezin dixwazin û ji bona û armancê xebatek zor dixeblit.

Kurdan Iranâ ev bîst sal in, ji hikumeta Iranê cend tişt dixwestin. Wan dixwest ko mêmür û karkeren û Kurdistana Iranê ji kurdan bêne bijartin; wan dixwest ko di xwendegahen erde Kurdistane de, seydâ û mamoste ders zaryan bi zimanê kurdî bibejin û zimanê kurdî di hemî xwendegahan de, bête xwendin; wan dixwest ko se çaryekan wêrguyan ko ji kurdan têne standin, di axa Kurdistana, ji bona çekirina pişû rî; xestexane, xwendegah, gundine û nûjîn bête serf kiran.

Lê heyf e ko Hikumeta Iranê guh ne dida daxwaza xelkê Kurdistanâ û kurdan ko bi navê mîletê xwe ev tişt dixwestin dihatin girtin, dihatin eşandin û zehf caran ji dihatin kuştin. Herweki dawya zilm û neheqiyê nîne; û hemî mîleten cihanê hin bi hîn, û her û her çavê xwe vedikin, û doz û dehwa leg û qeyneyê xwe dîkin, kurdan Iranê ji, edî serbesti û istiqlala Kurdistana ko di destê hikumeta Iranê de ye, dixwazin û ji bona vişti, dîkin her fidakariye bikin.

Heta beri bi sê salan, di axa Iranê de, kovar, rojname û kitêbîn kurdî bend û yesax bûn. Pişti ko eskeren rûsi û ingilîz ketine axa Iranê, kurd hînî bîna xwe standine û di nav van sê salan de, ji xwe re kovar û rojnameyine hêja derékistine; mina Peyam, Çiya, Niştiman, Kühistan, Tîrîskê, Zegros, û û Yekîtiya Têgusîn.

Li gora rojnameyên Tehranê kurd, ji bona xwestina istiqlala Kurdistanâ zehf biranî qedimandine dewleten mezin û kurdan Iranê dixwazin ko Şerîte Ettonîkî û qeydeyên ko Hevalbendan li ser azâhi û serbestiya mîleten danîne qênciya xwe, kevnedîr û rastmendîya xwe bigihînî mîlet kurd in, û kurd ji jê heq û para, xwe bîbin.

Rojname û ejensî cihanê qala daxwazîn kurdan kirine û li gora nûçeyen dawin Mela Mistefa Paşa, komandar Izet Ebdilezîz, kapten Mîr Hec, kapten Mistefa Xoşnaw, Ewiqat Hemze Ebdîlah, kapten Eziz Ebdîlah, kapten Celal Emîn, mihindîz Nûri Ehmed Taha, kapten Xeyrîlah, kapten Bekir, mihindîz Mihemed Qodsî, û pêncî mirexes û nimînende û minewerîn kurd bi di hezar peyan, xwe gihandîne kurdan Iranê û doz û dehwa istiqlala kurdistane dîkin.

Ji aliye din; hikumetîn ko lihevhatina Sadabâdê mor kirine, dîkin ciwanek deyin û bi daxwazîn kurdan Iran, Iraq û Tirkayê, mijâlî bîbi û hidîn eqle xwe bi ci awayî dikarin riya Istiqlala Kurdistanâ bigirin. Rojnameyên Tehranê ji aliye din, bi zimanekî gelek hisk direjî mîlet kurd dikin û dibejin ko heke hewce ye bi dara zore û dîve kurd bêne sekandin; lê wîlo dixuya ko kurdan Iranê guhnadine zîmîndirêjîya van rojaman û didin zanin, ko dema heq û edaletî hatîye, xurtî û cavorî, di pêşîya heq û edaletî de, bê qedir û qîmet in, û zorker çigas mezin ji bin, dawîya wan nîne û qesda mîlet kurd ev e ka dîke heqê xwe hîstîne û pê neheqiyê ji orît hîlin, û dostanîyeke nû, dostanîyeke qaim deyne nav bira mîlet kurd û ecem hemî cîranan.

Feqîr Elî

Bavê wêna jê diqehire, karê keçikê her roj wilo jê re dibêje; Sîltan pir jê qehiriye. Rojekê di vê xeberê de ne, carkê nerfî Feqîr Elî ket devê derî.

Sîltan nerfî, ko kesek jê feqîrtir hêj ne hatîye cem wî. Jê re go: kuro were vir; Feqîr Elî qedimî ba wî, Sîltan jê re got: ya Feqîr, ci te heye? Feqîr go: tiştîkî min tu ne? kulumk axa min tu ne ye!

Sîltan jê re go: were destê min, mi keçka xwe da tel Feqîr go: ji serê min zêde ye, du caran jê re got, Feqîr dibêje, ji serê min zêde ye. Cara sisiya, wezîr, destê xwe danî, ser devê Feqîr; û jê re got: kuro here destê wî; heger tu ne re wê serê te jêke!

Feqîr destê Sîltan maçî kir, Sîltan ji, ji cêriyên xwe re got: herin çekê qîzê jê bikin, hinik qetiyyaf lékin, ez bînerim bê, ki wek min heye, bila wan xwedî bike!

Kuncîlî keçikê jê kirin, hinik qetiyyaf lê kirin, destê wê xistin è Feqîr Elî û dehfik dan wana, di derenê wer kirin û gotin; de herin fcar. Feqîr rûnî û girîya û ji keçikê re dibê: xweha min, ez hatim ko bavê te danekê bide min, tu ji mîr bû bele.. ez nikarim xwe xwedî bikim, ez çawan fcar xwe û te bi xwedî bikim. Keçikê jê re got: rabe ser xwe, Xwedî mezin e, û ko min û te bi xwedî bike heye.

Feqîr rabû ser xwe, û bi hev re meşyan, daketin çarçiyê; Feqîr pars ji xwe re kir, wê gevê

tiştî ko anî xwarin, li ber dîwâreki razan heya sibehê.

Sibehê, kerwan bi re ket ko here Helebê, Feqîr Elî go: ya qîza delal, kerwan va ye, wê here Helebê, ez li vê derkê nikarim parsê ji bikim, wê kelkê me nas bikin, wê bêjin ev zavê Sîltan e; parsê bikim kîmanîye, lazim iñ herin Helebê.

Kegikê jê re got: kû de tu heri, eze bi te rel! Bi kerwîn re meşyan, gihane Helebê, keçikê ji Feqîr re got: eze cawân bi te re, bêm nav çarçiyê, bîgerim, û em kes nañ na kin. Lazîm tu heri beri ji me re ciki bîbîn ko em lê razin, û piştre were min bibe. Feqîr jê re got: bas e, tu li vê der, eze herim.

Feqîr cû nav çarçiyê, giha ber dikana yekî beqal, go: ji bo Xwedî tu cih ti cem te tu nene ko em, lê razin.

È beqal jê re got: Hecî Ebdela heye ko feqîr dehewine, here cem wîna, wê odakî bide, heya tu li vê der bi, xwarina te ji, rojê se wexta, wê bide te.

Kêfa Feqîr hat û jê re got: mala te avel... Ez mala wî nasna kim, è beqal lawê xwe pê re sand, mala Hecî Ebdelâ, pêg kiriye, feqîr cû cem Hecî Ebdîlah destê wîna maçî kir û jê re got: xwehek min heye, me divê tu me bîhewîn.

Hecî Ebdela jê re got: ser cava; here xweha xwe bîne; mifta Odî dayê; û jê re got: rojê se wexta were xwarina xwe bîbe! Kêfa Feqîr hat, cû xweha xwe anî, di Odî de rûnîstîn, rojê se wexta xwarina xwe tîne.

Cend rojekî man, keçikê ji Feqîr re got: here ji xwe re li çarçiyê bigere, belki Xwedî sebebek ji te re bişîne.

Feqîr go: bas e, daket ji xwe li çarçiyê digere, carekî nêri ko kerwanek li ber deriyê xanê barê di xwe datin. Feqîr ji xwe re got: eze herim alkariya wan bikim, belki tiştîkî bidin min.

Cû alkariya wana kir, bare wan datîne, mezinê bâzîrgen, navê wî hecî Elî ye; lê nerfî go; ev Feqîr lawîketî hêja ye, jê re got: kuro, tu bi mi re nayî, bi salê bişûxile, ûz heqê te bîdime te.

Feqîr Elî jê re got: belê, tu û sala min ci bîdî min!

Go: eze sala te hezar qîrûşê bidim te û tê bîxwî û çekê te li ser min! Feqîr je re go: bas e, belê eze herim bi xweha xwe bişewirîm; heke go here, eze hemî.

Hecî Elî mensefek xwarin dayê li gotiyê: here, bi xweha xwe bişewirî, heke go here, were sibehê emî herin, û heke ne hist tu bê, mensefek me ji me re werine, tu zora me li te nîne. Feqîr Elî rahîst mensefek xwe û bir cem xweha xwe; xweha wi nerfî ko mensefek got û birinc va ye anye.

Xweha wi got: rovîki geri-yayî, ji şerîki razayî çêtir e, heger tu ne çûna, wê ev xwarin ji kû bibata...

Feqîr jê re got: tiştîkî din li cem min heye, va ye, mi ji xwe re şixulek di ye, yekî tacir, ji mi re dibêje, sala te bi hezar qîrûşî, ez hatime, bite bişewirîm; keçikê jê re got: bas e, heri cem

Dîwan û gerfinendekariya Rojnamê: Bérüt-Birc: Weqîf Tabet, Telefona Dîwan: 74 04; Telefona Malâ Xwediye Roja Nû: 84 41. Edresa telg: Bérüt-Rojanû.

wi, jê re bêje kanf nîvî meşîn, bide min, eze ji xweha xwe re bibim û édi bala bimine; heya sala me bigede.

Heger da te, bîne û pê re here; heger ne da te me re, rizqê me li Xwedî.

Feqîr vegeziya cem Hecî Elî è tacir, mensefa wi dayê, jê re şerîn xwe go. Hecî Elî ulî meşîn wi dayê û go: de here, sibehê were.

Feqîr hat cem xweha xwe, meşîn wi dayê, keçikê jê re got: here cem hecî Ebdela, jê re heye, eze va herim, xweha mi wê li cem te be.

Feqîr cû cem Hecî Ebdela jê re got: ya hecî, eze va herim, çavê te li xweha mi be! Hetayî wê wexte Hecî Ebdela xweha wi dî, ne dîli bû.

Go: here xweha xwe bîne, eze bibînim. Feqîr hat xweha xwe, bir cem Hecî Ebdela, gava Hecî Ebdela xweha wi dî, pîr qehîr, şeqamek li Feqîr xist û jê re got: le ji mi re gotiye xweha mi feqîreke weke mi ne, ci stèle ye ko ev di vî half de he.

Roja ewil ko tu hatî, te ji mi re goti bûna minê ciki xwe bidana we.

Evet keçik, keçka mezina xuya ye, de xem na ke, here, dilî te bîla rahet be; ev keçik ma keçka me; û di pêsîra xwe re kîşandin û kirin keç xwe. Feqîr cû cem è tacir û bared xwe bar kirin û meşîyan; berî xwe dane Bekdê.

Bîrik heye di Kerbelê de, heger kerwanê ko ji Bekdê û ji Stenbolê û ji Helebê tê, li wê derî digiştîn ser hev.

Ew bîr kesik ne wêre dakeviyê, heçî dadikeviyê sax venagere. Her sê kerwan, gihane wê gevê ser wê birê. Barê di xwe danîn, delîlî ban kir, heçî dakeve birê, avê ji heywana re derxînê, emî pêncî mecidî bidine wi.

Feqîr got: bi Xwedî ezé dakevim, ma sala mi, hemî bi pêncî mecidî ye, ev saetik e, ezé dakevim birê; bi pêncî mecidî. Rabû ser xwe, Hecî Elî jê re got: ez na hîlim tu heri.

Feqîr jê re got: ezé herim, heke ez vegeriye sax, ezé pêncî mecidî bîstînim, heke ez mirim tu bîstîne û ko te dayê min jê hilîn, û e mayî bişîne ji xweha mi re.

Cû ser devê birê, şerît pê ve gîredan, daxistîn birê. Gava giha carekî li miqabil xwe nîrlî, di ko pîrek heye, çîçikên di wê li pişta wê ne; pişta pîr li wi ye. go: ha, a ko xelkê dikuje ev e; hedi çû ji par re, çîçikên di wê xistîn devê xwe.

Pîr jê re got: tu ma lawê min! De here avê ji wan re dagire û ji wan re bêje, sibehê pêncî mecidî heye an tu ne ye, heger ko heye, bîşew ez di birê de razim, were cem diya xwe, tu şew mehvânî min i. Feqîr av ji ehîn kerwana re dagir, ji wan re got: sibehê honê, pêncî mecidî cardî bidine mi, heya ko ez dakevim birê; jê re gotin erê.

Feqîr got: ko wissa ye, eze işev di birê de razim.

ne qediyave

Tefsîra Quranê

173- Gelf mirovino... ji bal xudayê we, ji we re delîl û hicetén mezin hatin û xuda ji we re ronahiyeke aşikare da dahatîn.

174- Lé yén ko baweriya xwe anfîne û xwe avêtine bextê xuda û desten xwe ji gunehan kışandîne emê wan bigehfnin kerem û piyariya xwe û bikin riya rasitiyé.

175- Pêxemberê min... ji te pîrsâ para mifretxweran dê bikin bêje: Emrê xnda ev e; heke mîrathiştê ne dê û bhw û ne ji zaro

dihêle ji mîfratê wf xweh û bîrâyîn wî bi awayf jérîn behremend dibin; heke mîrathiştê ji dê û bav an ji bav xweheke dihêle, nîvî mîfrat jê re ye; heke mîrathiştê jînek e û ji dê û bay an ji bav birayek dihêle mîfrat gî jê re ye. Heke dido an zêdetir xwehîn wî hene ew du sîyekên mîfrat dibin; heks bira û xwehîn wî hene ji mîfrat para birayen dido a xwehan yek e. Ev emrên xuda ne, xuda hikmîn xwe pêş me dike, heta ko hon xeletan me kin. xuda her tîstîf dizane.

Sûreyê Sîfrê

**Sed û bist û sê ayet
in, di**

**Medînê de dahatiye.
Bi navê Xudayê Pak Û Di-
lovan û Mîhrîvan**

1 - Gell bawermendino... ji soz û gotina xwe vemegerin, qđrê wan bigirin, pîrsen xwe xira me kin...

2 - Ji we re goşte heywanen çarpe helal e, ji wan pê ve ko emê herambûna wan pêş ve bikin û goşte nêçrê ko di dema Heramê de dikan, ji we re heram e. Xuda li gora daxwaza xwe emrê xwe dide.

3 - Gell bawermendino... destîrîjîya qeyde û aynîn Hecî me kin, bi kuştî û talanî ewleyîya meha miheremê û ewleyîya mîrovîn ko qesda Hecî kîrine û pê ji kerema Xuda hêvîdar dibin û rîza Xuda dixwazin xira me kin û wan metîrsin û toq, kap, beristo û şinok û hîvokên heywanan ko di hecî de wê bêne şerjekîrin, xira me kin.

Gava hecîqede û hon ehramê ji xwe dikan, heke dixwazin dikarin edî herin nêçrê; hon, ji mîletê ko riya Mescidî Heramî gîrlî bû, enîrlî; xwe bigirin dirêjî wan me kin û gunehkar me bin; qenciyê pêl bînîn û arşakîriya qencîkeran bikin, ji xirabiyê dest bîkîşîn û arşakîre gunehkar û silnîkaran me bin; ji Xudayê xwe tîrsîyar bibin û bîzanîn ko Xuda bi awakî dijwar dijne.

4 - Goşte heywanen miri, xwîna heywanen şerjekîri ko rijihaye, goşte beraz û goşte heywanen ko ne bi anfîna navê Xuda; lê bi anfîna naveklî din hatine şerjekîrin û goşte heywanen xeniqandî ji we re heram e.

Goşte heywanen ko ji lêdanê, bi lê dana quloçê heywanen din, bi qetandîna cinawiran; an bi ketinê mirine, ji we re heram e, meger ko hon berfî mirîna wan bigehne wan, û wan şerjî bikin, vê gavê goşte wan ji we re helal dibe. Goşte heywanen ko bi anfîna navê pûtekî hatine şerjekîrin jî, ji we re heram e. Leyistîna qumarê û remîl jî ji we re heram e, ev tîstîn neçê ne. Kafir herweki sehkîrine ko hon, ne niho, û ne didawiyê de destji dinê xwe bernadin û na kevin pey wan; pê dilê wan kafîran res bûye û ew gehîrîne; hon ne ji wan lê ji min bitîrsin.

rakirina destmîja mezin an biçuk ferz dibe û av na keve dest, an ji ber sebebekî giran; her çend ji hon dixwazin; anfîn an pêda kirina avê ji destê we na ye teyemimê bikin. Teyemim bi axa pak tê rakirin; mîrov divî bi axa pak desten xwe heta enîşkan û rûyê xwe bifîrîkîne. Xuda ji kerema xwe na xwase işe û we giran bike û ji ber vê yekê paqîjbûna we bi teyemimê ferman kirîye û destûra xwe daye; ev nîmetâ Xuda ye, qenciyâ wî binin bîra xwe da ko hon pê şikîdar bibin.

8 - Nîmet û qenciyê Xuda û ehda ko di nav bîra we û wf de hate kirin bînîn bîra xwe û ji bir me kin wê dema ko we got: me bihist û me bindestiya wî kir. Ji Xudayê xwe tîrsîyar bibin: Xuda qencî û xirabiyâ dilê mirovân dizane.

9 - Gell bawermendino... Hon herli ber Xuda ne, divê kirina we li gora edaletê û gotina we li gora rastiyê be. (Qenciyê bikin û rastiyê bejîn). Gava şehdetiyê didin dest ji rastiyê bermedin, di gotina rastiyê de bê tîrs û perwa pê bidin erde.

Divê kîn û erna we, we nexa, pîne, di heqê kafirekîde be ji; ko hon jê dienitin, dev ji rastiyê bermedin, li gora edaletê rastiyê bejîn û neheqîtiyê me kin, di heqê dijmin û mezinên xwe de ji; bîters û perwa rastiyê bejîn. Bizanîn ko bi gotina rastiyê û kirina edaletê mîrov digehe baweriyê û bi berdانا wan jê ve diqete. Xuda emelê we dizane.

10 - Xuda ji mîrovîn bawerînd re û ji qencîkeran re mîzgîniya xweşiyê û efiwa xwe daye.

11 - Yen ko kafir bînîn û aye-tén me inkar kirine ew jîxelkên dojehê ni û tê de her dimînîn.

12 - Gell bawermendino... qencî û nîmetâ Xuda û wê dema ko mîleteki dixwest direjî we bike û Xuda ji kerema xwe destê wan ji we da bi sînda kîsandin bînîn bîra xwe, ji Xudayê xwe bitirsin û bîzanîn ko mîrovîn bawerînd divê nefsa xwe bispîrîn Xuda.

13 - Lawîn Israfl ji Xuda ra sund xwar, wî ji wan diwanzde rîber da bijartîn û Xuda gote wan: Heke hon radîbin nimêjê, zekata xwe didin, bawerîya xwe bi pêxemberê min tînîn, qedre wan digirin, arşakîre wan dibin û di riya Xuda de ji malê xwe comerdîyê dikan, di şer û kuştîne de ez arşakîre we me. Ezgunehîn we efiw û we ji wan paqî dikim û we digehînim buhuştan têr av û kanî. Yen ji we ko ji vê paşî kafir dibin divê bîzanîn ko ji rastiyê yekcar dûr ketine.

14 - Herweki wan edha xwe xira kirine, Xuda wan ji piyariya xwe gewirandin û dilê wan hiskî kirin; wan gotinê kitêba xwe gohartîn û şehdetiya kitêba xwe, li ser mîzgîniya batina bezma Muhammed avetîn pişt guhê xwe û ji bîra kirin. Tu, wê seh bîki piraniya wan çawan bêbextî kirine; çendekîn ji wan xwendî bext bûn û bawerîya xwe anfîne; tu li qisûra wan me nêre û di suçen wan bibore û bîzane ko

Xuda ji qencîkeran hez dike.

15 - Yen ko goti bûn, em file ne, wan ji ji me re sund xwarin û soz dan ko ew pêxemberîtiya şandîyê Xuda wê tesdiq bikin, lê ew piştre li gora emrîn kitêba xwe Inclî ne meşîyane, ji ber vê yekê, me dijmîntî xist di nav beyna wan de, û ew heta roja piştdawiyê bi hev kevin; Xuda bê şik wan berpîrsîyar bike û bi dana cezayê emelê wan ê kirêt wê bêxe pîgiya wan.

16 - Gell xudankîtêbino... me pêxemberê xwe şandîye ta ko ew piraniya hikmîn kitabê ko we vedîart, pêş we bike û di hîn kikmîn wê ji bîbore.

17 - Ji nik Xnda ji we re roniye zelal, roniya Bezma Muhammed û rastîyeke aşikare, Qurana Mezin hat.

18 - Yen ko li gora emr û fermân Xuda dimesin, Xuda wan ji şik û kufre dertêxê û digihîne roniya baweriyê û dike ser riya rastîye.

19 - Yen ko gotine, Xuda, Mesisî kurê Meryemê ye, ew kafir bûne; bêje: heke Xuda bîxwesta dikarî bû, Isa kurê Meryemê û diya wî û her kesê ko li ser erde ye mehiw bike; ma kî dikarî bû destê Xuda bigere? Her tîstîn erd û ezzamanan û her tîstîn ko di nav bîra wan de ne milkê Xuda ne, ew her kesê ko dixwaze dixiliqîne û ew bi her tîstîf dikare.

20 - Cuhf û filan got: em kurên Xuda û delalên wî ne. Bêje: heke we re ye, cîma Xuda we sebâ gunehîn we dişgîne? No.. ne we re ye; hon ji weke mîrovîn dijîn evdîn Xuda ne. Xuda her kesê ko dixwaze digehîne efiwa xwe û her kesê ko dixwaze dişgîne. Her tîstîn erd û ezzamanan û her tîstîn ko di nav bîra wan de ne, milkê Xuda ne û hemî vedigerin ba Xwedê.

21 - Gell xudankîtêbino... di dema qutabûna hatina şandîyê Xuda de, me ji we re pêxemberê xwe Mihemed rîkir, ta ko hon di roja piştdawiyê de me bejîn, ji me re pêxemberek ne hatîye û çavê me bi mîzgîni û cezayê Xuda venekirîye. Ji ber vê yekê me ji we re pêxemberê xwe jan diye, ew mîzgîniya qencîkeran dide û mîrovîn xerab bi cezayî ditîrsîne, Xuda bi her tîstîf dikare.

22 - Wê demê bînîn bîra xwe.... Mûsa ji qewmî xwe re goti bû, gell mîrovîno... qenciyâ ko Xwedê bi we kîrîye bînîn bîra xwe, Xuda ji we re, ji we, pêxember şandîn û padîşah dan bijartîn û ji we re tiştîne welê da ko bêriye we; wî ji tu kesî re, ne da bû.

23 - Gell mîrovîno... bikevin erde mîqedes, welaletî Qidis û Samî û dora wan, Xuda axa wan dera kîrîye qismeta we û ji tîrsa salîman bi sînda vemegirî, heke we li gora vî emrî ne kir, bîzanîn ko hon, ji dînya û axirete bê par dimînîn, dibin şerpeze û dikevin xîşanî,

24 - Wan got: di wî welaletî de mîleteki zâlim û xedar heye, heta ew ji wê derê derkeve, em na kevinê; ko derketin em dikevine.

25 - Ji wana du mîrovîn ba-

wermend, ko ji Xudayê xwe tîrsiyar bûn gotin: ji dergehê wî wellaff bikevinhundurê wî, her çend ji xelkên wî ziremér in, dilê wan sist e, bi izna Xwedê honê zora wan bibin û wan jê derfinin.

26 - Wan bi ser ve zêdekir û got: heke hon bavermend in, ji Xudayê xwe ewle bibin û xwe bispérin wî.

27 - Cuhiyangot: ho Mûsa... heta ko ew jê derkevin, em tu cara na kevin... Tu u Xudayê xwe herin û diréjî wan bikin. Binêre... em vê deré rûniştine.

28 - Mûsa ji Xudayê xwe re got: Xudayê min, ez ji nefsa xwe û ji ya birayê xwe Harûn ber pirsayar im, birayê min bi ya min dike; tu me êdî ji vî mîletî me hesibîne.

29 - Xuda ji Mûsa re got: min welatê Qids û Şamî û dora wan welatan ji vî mîletî re heram kiriye, êdî bila ew cil sala di heriya Tihê de perşan û zendemayıf bîmînin, tu ji xema wan bêbextan me xwe.

30 - Pêxemberê min... ji xudan-kîteban re qiseya Habil û Qabil kurê Ademî, li gora rastiyê bide zanîn. Gava her yekîji wan ji Xuda re qurbanek anîn, Xuda qurbana Habil qebûl kir, lê ya Qabil qebûl ne kir. Qabil ji Habil re got: ezê te her hal bikujîm, Habil lê vegerand û got: Xuda qurbana mirovîn ko ji tîrsiyar in qebûl dike.

31 - Habil ji Qabil re got: heke tu ji bo kuşlina min destê xwe dirêjî min ji biki, ez ji bo kuşlina te, destê xwe hilnayênim, ji ber ko ez ji Xudanê erd û ezmanan tîrsiyar im.

32 - Ez dixwazim ko tu gunehênen min û xwe hitigir û ji xelkên dojehê bibî, peyayê zâlim û xedar cezayê xwe di dojehê de, dibînîn.

33 - Qabil gubdariya ern û şeyda xwe kir, ji ber xwe ket û birayê xwe kuşt, dîn û dînyayê xwe, dawî û axireta xwe xira kir.

MIRIYËN KO VEJIYANE

Ma mirî ji vedijin? Fen û kitêbar gotiye ko mirî navejin. Lî jê re ji awarte heye. Kitabên miqedes didin zanîn ko İsa pêxember, piştî ko cihîyan ew bi dar ve kir û vesart; ji tirba xwe rabû û çû ezmanan.

Miriyen ko em dikin vejandina wan ji xwendevanen xwe re bidin zanfa mirîne nemirî ne.

Li bajarê Misrê zarokekî dwanzdeh salt winda bû bû. Bavewî, piştîko qederekî lê geriye elam da polfsan. Wê rojê ji tramwayê pê li du zarakon kirî bû. Polfsan bav birin xestexanê û ew zarok pêş wî kirin. Can û serçavân zarokan pelîxt bûn. Di gel vê bindê bav di wan zarakan de kurê xwe nas kir û cendekê yekî hilanî û anî mal û elam da mirov û nasen xwe. Şîna wi girêdan û zarok vesartin.

Cend roj ketin nave. Wextê nîvro, xelkê malê li ber taetê bûn. Ji nişkekê ve derî vebû û lawîkê mirî ji derî ve da. xelkê malê tîrsîyan. Ma kurê

wan bû bû seytanqûni? Ji ber baz dan û xwe dan paş. Ayeta Kursî dixwendin. Ma kurê wan è masûm ewçend gunehkarbû bû ko bihe şeytanqûni.

Dawî, lawik ji xelkê xwe re da zanîn ko herf çend rojan bêl ko xeber bide wan çû bû gundê xwalê xwe û fro jê vegeperiya bû.

Dê û bav bi kurê xwe è vejiyayî şabûn, lê bav li mesrefa cenazê diket. Rabû çû xestexanê da ko wan peran ji xestexanê bistine. Bav digot: Ma kê ji we re gotiye ko vesartina miriyê xelkê li ser min e.

Sagîrîn dibistana tibiyê di dora masa teşrihê de li hev gîha bûn hev. Roja dersa teşrihê bû. Seyda Kérîk bi destî ve kete hundîrê dersxanê û çarîk ji ser cendek rakir.

Wextê seyda ker da laşê mirî, xwîn jê vîziqî Seyda xwe ji cendek daye paş.

Ma ji cendekê miriyen xwîn diviziye; xwîna miriyen cemidiye. Ev bu bûn bîst û çar saet ko cendek holtibû teşrifxana dibistana

tibiyê. Cendekî yekî feşir û bêxwedî.

Ji xwe gelek ne borî cendek xwe tev da û mirî rabû ser xwe û li seyda û şagirtan sekînî.

Ma qawân mirî vejiya bû. Mirî ne vejiya bû lê mîrik ne mirî bû; bi tenê dîlê wi ji bîr ve çû bû. Nişterâ seyda xwîna wî tev da bû û hisê wî anî bû serî.

Ma şîk heye ke heke mîrik ne î feşir biwa û cendekî wî ne sipartana teşrifxana dibistane wî zindî bîhata vegartîn.


Di bajarekî Ewropayê de zelameki dewlemevdî mirî bû Herweki di wan weletan de adet e bêl ko mirî bişen cilîne nû lê kirin û ew xistin nav tabatêkî de û dora tabatê bi gul û kulfikan xemîlandan û gîhandin dêrê; cereberiyeke mezin ji pê re.

Li dêrê keşî ayına miriyen çekir, û dia miriyen jê re xwend û ava miqedes li rûyê wî reşand.


Dikirin ko tabatê rakîn, bêxîn erebekê de û bibin gornistanen. Ji nişkekê ve mirî xwe tev da û rabû ser xwe. xelkê ji derê baz da.

Mîrik bî mirîna derewîn keti bû; çend dilopén ava keşî en honik ew hisyar kiri bûn.

MIRÉKA CIHANÉ



Ji avahîyen Seygonê Qesreke çeleng, Erdêne Rôhetât Dûr, erden Hindistan, Çin û Hindiçnîyê bi qesr û payedari û ibadelgehan xwe ën spehi bi nav û deng in.



Rome, payetxte Italyayê şarîstanek ji yên erde Ewropayê i qedimînî.

Li Cizîrê

Nûcagîhayê me dînivise:

— Di Cezîrê de baranine boy û xuri bariyane û pêriyê gundi û cotkaran keniye.

— Sefirê Sooyetistanê li Şamî Mirza Solo hatîye xwalîrwanîya Cezîrê, em jê re li ser çavau hatî dibêjîn. Mirza Solo sîv li ba Mîhafez Dêra Zorê è girangîmel Xalîb Beg Mirzo xwarîye û çavê xwe li bajar û avahîyen Dêra Zorê gerandine û piştî hatîye Hesece û Kamîslakê û dolira rojê vegerigaye Şamî.

— Mifetîzê Cezîrê è zantî à xwendegahan bi xegreteke xwes dixebite, bi himeta wi, di Hesece û Kamîslakê de, ji bona xwendegahîne nû, şar avahî hatîne kirî kirin.

— Ji bona bedenparêzîyi li zehî de ran de meydanine spehi dé bêne çekirin.

— Bi himeta mifetîz 300 textebend 20 mase, 20 depreş, 10 dolab, û 50 rûniştîk hatîne rekîrin xwendegahîn Cezîrê.

Strana kurdî:
LO SIWARO!

Lo siwaro, lo siwaro; kedera dilê min; egito, xwesmêro, maqilo, dawida-ro; mi di Lifê bi sê denga kire gazi, go; tê Nûrê, tê Nûrê; Xwedê hebina tu rabe, bi leski bîlezine; Sînbozê, mehîna bavê xwe, ji tewlê bi dêrîne; teng hertengê Sînbozê bi qayîş mîrigê çep û rast bişî-dîne; kark û heuraniyê bavê xwe li na-mîlê wî xinê, modelîka devirâr bi destê bavê xwe bigihîne, bila Hesê Brahim, bavê Nûrê li siwar bê, bila berê xwe bide qeseba bajarê Almedina, bila mefrezak eskerê cîmîndîji Almedina biderxîn; bila bê, heft sala tehbîbat malo Remîm bîke; bila mezîna bigirê, bi eskerîgê xinê, bila berê wan bide Paxîvînâden, heft salan eskerîgê bi wana bigedîn; wê xelkê bibêjîn, ev nîşana bêbextîyê ye; bila heyfa bavê kala ji mala Remîm hillê!....

Wê gavê, Nûrê Sînbozê ji tewlê bi der tîne, teng û berlengê Sînbozê dişidîn, kark û heuraniyê bavê xwe di na-mîlê wî datîn; modelîka devirâr bi destê bavê xwe digitîn; mi di Hesê Brahim, bavê Nûrê, kekê Melo, cinê siwaran, héçê mîra, siwar bû, berê xwe da, qeseba bajarê Almedina; li ser pisto Hemra dajo, hay ji bayê felekê tu ni-ne.

Mi di Lifê bi sê denga kire gazi, digo; lê Nûrê, Xwedê hebina tu rabe, bi bezkê bîlezîn, mîfî li sendîqa ezzîmî dîzinê, dûrbînê ji déka xwe re binê, ezê li ber gavê xwe è rastî deyîm, ezê pêsiya Hesê Brahim, bavê Nûrê, kekê Melo, Cinê Siwaran, Hêçê Mîran, ezê teftîş bikim; tîrsa min ê ji wê tîrsê, hinik ji wan kükîçê neyarun; kemînê li pêşîya Hesê Brahim, bavê Nûrê deyîn, mî bîkujîn Hesê Brahim, bavê Nûrê; wê gîra mala bavê min, yetama Xwedê, ji évar de, biteftain. Mi di Nûrê rabî, mîfî li sendîqa ezzîmî dîzinê, dûrbînê ji déka xwe re tînê, Lifê li ber gavê xwe datîn, dinêri li negeba Bûkê; li Quçîka li riya xopana Almedina dimeyîzîn; nîri ko sê peya li negeba Bûkê, li pêsiya Hesê Brahim, bavê Nûrê rûniştine; mi di Lifê bi sê denga kire gazi, go; lê Nûrê, porkurê; ez çigas dimeyîzînum na meyîzînim, sê peya li pêsiya bavê Nûrê, li negeba Bûkê rûniştine, ez ne ma zanim, ewan her sê peya ki û ki ne!...

Heydîka Nûrê radîhêjê dûribinê li ber gavê xwe datîn, dinêri li Quçîka li negeba Bûkê, li her sê peya dimeyîzîn; Nûrê bi sê denga kire gazi, go; Lifê, porkurê, nemayê, ewan her sê peyan, peyayê pêsi Eminê Perîxanê ye, peyayê bi dû da Osmanî Mîrza ye, peyayê diwayî Mecîdê Segman e; her sê peya li pêsiya bavê Nûrê rûniştî ne, bi sê kemînê giran e.

Mi di, Lifê bi sê denga kire gazi, digo; Nûrê, porkurê, nemayê; Xwedê hebina tu ê rabê, qasidî bi dû bavê Nûrê de bîstîn; bila malumatê bidîyê belki tu bavê Nûrê ji ser pê kemînê vegerlinê!...

Gava ko Hesê Brahim, bavê Nûrê bi miqabil negeba Bûkê dîkevet, Eminê Perîxanê bi sê denga ban kir Mecîdê Segman; digo; lawo, Mecîdê Segman, tu bejn û bala bavê Nûrê bi gavê serê xwe dibînê; Xwedê hebina tu enîşka cepê li erdê biçikin, tu enîşka rastê li qandava modelîye bişîdin, çavê çepê bigirê, ê

rastê li nîşanê biskinin; derbehê berde bejn û bala Hesê Brahim, bavê Nûrê, tu bi derba ewil ra, dil û gurçikê ji kezeba reş bîfirin; heke tu bi derba ewil ra, dil û gurçikê Hesê Brahim ne firin; gava lô diqevine, roja qenamê min gelek caran, derbê Hesê Brahim bi çavê serê xwe din; kum û kolosî botanî li devê xwe datîn, êrîş dike ser kozikê neyara; ez yahtîdî wî me; destê xwe ti qepla xencerâ qapîne dişidîn, mode-lijê bişîanda davêjê; û êrîş dike ser kozikê neyara, bi qepla xencerâ, getek modeliga ji destîn getek kurîn ciwan-mîra ji kozik û meterisa bi der tîn!....

Mi di Eminê Perîxanê bi sê dengan kire gazi, ban dikir Mecîdê Segman, lawo, Xwedê hebina tu rabe enîşka cepê li erdê biçikin, û enîşka a rastê li qandava modelîye bişîdin; çavê cepê bigirê, rastê li ser nîşanê biskinin derbehê berde bejn û bala Hesê Brahim, bavê Nûrê, tu bi derba ewil ra, dil û gurçikê û parîkê ji kezeba reş bîfirin!...

Mecîdê Segman radibe, enîşka cepê li erdê diçikine, derbek davêje, Hesê Brahim, bavê Nûrê, kekê Melo, Cinê siwaran, héçê mîran, bi derba ewil re, dil û gurçikê û parîkê ji kezeba reş dişîrin...

Gava Hesê Brahim, bavê Nûrê bi sê denga kire gazi, ban dikir Eminê Perîxanê; lawo, mi di bexlê d... te n.... xwezel ne bi surla bêbextî bûna, lê derbê Hesê brahim, bavê Nûrê bi çavê serê xwe bidîna ...


Dilê min hîr e, bi sed carî hîr e; mi di sibehê bi kubara sibehê re hate ciwaba neyeyr; mi di Lifê bi sê denga kire gazi; digo Nûrê, porkurê, nemayê; mi di Hesê Brahim brîndar e; ez ne ma zanim ji par re, ne ji pîr re; mi di Nûrê bi sê denga 'kire gazi, digo; tê Yâdi gotinên fitne û fesîda, Hesê Brahim, golîna ko tehbîbat malo Remîm dike li bajer e.

Dengbêj : Ezîzk

PÊJINÊN DINYAYÊ



Sarıstanen Ewîipayê mirêkên pêşveçâna vê erdê ne.



Kurdeki wê bibêje ev e gola Wanê û çiyayê me ê bilind û mîgedes Ararat; payedariya azahî û serhestiya Kurdistanê.

Rojnamevanekî Misri Qala Kurdistanê û doz û dehwa wê dike

Rojnama Misri, El-Misri de, nivîseyanê erebi Mehîmûd Ezîm beg dînîvise: Pirsa Azîrbîcanî, ji ya kurdistanê nikare hêlê vegetandin. Di Sovyetistânê de, nîzîkahî ve 170.000 kurd hene; ew bi zimanê xwe dixwînîn û dînîvîsinin û karên welaletê xwe bi destê xwe dîgerînin; ew xwendî idareke xas in. Ev erdê tenîşa kurdistanen Tirkye, Iraq û Iranê de ye. Hêj, di destpêka serê mezin û 1914-1918 an de, kurd, perçeyê erdê kurdistanê dixwestin bigebînim hev û dû xwe re hikûmetek kurdî a misteqî deynin; û van tu caran dest ji armancâ azahîyê bernedane û ji bona xelasîya xwe ji nîfrîn hikûmeten biyanî her û her xebîtîne. Mîletê Kurd bi eşq û hesret li pêşveçûna kurdên Sovyetistân û li tişlîn ko ji bona kurdan de hatîne çekirîn, dinîren. Azîrbîcan tenîşa Kurdistanê Iranê de ye; û ji xwe agirê biserxwebûna kurdan li Iraqê; bitenê ev çend roj in ke vemirîye.

RADYO

Weşnîkên heroje bi zimanê kurdî:

Li Bérâtê:

Radyo Bérâtê; hero pişî nîro, li saet pênc u sih deqîqan de, li ser pêlén kurt û navîn bi zimanê kurdî nûçeyen Cihanê ûn dawîn belav dike. Dirêjahiya pêlan: pêlén kurt 37 métir û 24 sentîmêtir, an 8 036 kilo sikil; pêlén navîn 411 métir, an 730 kilo sikil.

Li Bexdaye:

Hero pişî nîro di saet çaran de, destpê û heta pêncan dom di-

ke. Dirêjahiya pêlan: 42 métir û 37 sentîmêtir; pêlén kurt.

Radyoa Kurdistanê:

Li ser pêlén kurt diwesine; dirêjahiya di wan; 42 û beta 44 û nîv métiran; berî nîro li saet 11 û 45 deqîqan de, dest pê dike; û nîv saet, dom dike.

Radyoa Azîrbîcanê:

Hero pişî nîro der saef pêncan, li ser pêlén direj bi kurdî diwesine. Pêlén direj: 1410 û heta 1415 métiran. Ji van pê ve hin radyo-yê dînyayê stranê kurdî diwesînîn; mîna yê Moskowa, Erlwan Paris û Londre.